Civakên Ewropî ber bi pirrengbûnê diçin!

»»» R:7







Parvebûn, sedema windabûnê ye

»»» R:3



Yekîtiya Partiya Demokrat, hewcehiyek bona Îranê

»»» R:4

“Joe Biden” û qeyrana Sûriyê

»»» R:8



*Bidestîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (387) 06-12-2020 Buha (1000) Tûmen

## Ewlehiya hilweşiyayî

**Roja Înê 7`ê Sermawezê li “Abserd” a ser bi Demawendê li nêzî bajarê Tehranê, “Muhsên Fexrîzade” berpirsê Saziya Lêkolîn û Dahêneriyê a ser bi Wezareta Berevanî ya rejîma Îranê û yek ji kesên pilebilind ê bernameya navkî a rejîma Îranê hate kuştin. Kuştina wî mohreyê girîng di biyavê navkî de komek pirsyar û eger li pey xwe anîn.**

Herçend piştî kuştina Fexrîzade berpirsên rejîmê bê yek û du, û bi bê hebûna ti belgeyerkê ragihandin ku Îsra`îlê ew kare kiriye, lê eva ku girîng e û hewce ye ku em di vir de bas bikin, ev rastiya ye ku bi kuştina Fexrîzade cardin birînên ku nehatinî dermankirin ên wekî kuştina Qasim Silêmanî anî bîra Îranê, û ew ewlehiya xeyalî ku bi salan e hewil dide bi pare û propagendeya xeyalî û kuştar û terorê bi dest ve bîne, hemû têk çû û pêkenîna xelkê li pey xwe anî.

Piştre bo vê ku vê bûyerê serpoş bikin, her yek ji berpirsên hikûmetî bi awayekî tirsinokane bertek nîşan dan, ji bilî vê ku li ber wan winda bibû û ditirsiyan, heta wan nedizanîn Fexrîzade çawa hatiye kuştin. Her yek ji berpirs û dezgehên rejîmê çîrokek digotin, ku ev jî çîroka wan wekî hev nebû û eva jî vê yekê îsbat dike ku dezgehên serkutkar ên rejîmê ne tenê li ser bikuj, belkî li ser çawaniya bûyerê û bikujên wî berpirsê navkî yên xwe ti zanyariyek wan nîne, û tê de mane.



“Elî Xamineyî” rêberê rejîma Îranê, di peyameke kurt de daxwaza cezayeke tund bo biker û biryarderên wê bûyerê kir, lê navbirî ti îşareyek bi rola Îsra`îlê nekir.

Serkomarê rejîm Hesen Rûhanî roja Şemî 8`ê Sermawezê kuştina “Muhsên Fexrîzade” bi dawî pîlana Îsra`îlê bo afirandina fitneyan bi nav kir, û basa vê yekê kir ku Îran di dema hewce de wê bersiva wê kiryarê bide.

Ew gef û givaşane di demekê de têne ser ziman, ku Wezareta Îtila`ata rejîma Îranê gotibû çend meh berî niha û heta çend rojan berî ku Fexrîzade bê kuştin, me hişdarî dabû parêzerên wî.

Di vê derheqê de Elî Rebî`î berdevkê Wezareta Îtila`ata rejîma Îranê basa vê yekê kiribû ku heta cihê bûyerê jî dabûne parêzerên Fexrîzade. Kuştina karnasên Etomiya Îranê di halekê de ye ku berê jî “Mihemed Husên Kazimî” cihgirê Hifazeta Spaha Pasdaran gotibû, ji wê demê şûnda ku parastina canê zanayên etomî dane destê Îtila`ata Spahê, metirsî li ser canê wan nemaye.

Herwisa “Husên Elayî” fermandeyê berê yê Spaha Pasdaran derheq rexneya ewlehî tekez kiribû ku zêdetir ji deh salan e ku Îsra`îl di nav hundirê Îranê de operasiyonan lidar dixe, ku yek ji wan operasiyonan, terora zanayên Îranê ye.

Navbirî gotiye: “Birêvebirina operasiyonên Îsra`îlê di Îranê de gelek pêşkevtî ne, û ew bi zanyariyên serast piştgerm in”. Di vê derheqê de rojnameya “Urşelîm Post” dabû zanîn ku, kuştina Muhsên Fexrîzade, şermeke mezin e bo rejîma Îranê.

Wê rojnamê wiha jî nivîsîbû: “Rejîma Îranê şermezar e, kuştina Fexrîzade di mehekê de hate encamdan ku her di vê mehê de kesê duyem ê Saziya El-Qa`îde li Tehranê hate kuştin, û van bûyeran nîşan da ku rejîma Îslamî ya Îranê nikare ewlehiya ti kesekî dabîn bike”.

Ew şêwe lêdwanên berpirsên rejîmê hevdem bûn digel daxwazeke cihê heyrîmanê ji xelkê Îranê, ku mohra erêkirinê li wê gotinê da, û dibêje: Ewlehiya rejîmê pûç e! Dezgehên Ewlehî û Îtila`atî yên rejîmê bi şandina SMS bo hejmare telefonên xelkê, daxwaz ji wan kiribûn ku her zanyariyek li ser biker û bikujên Fexrîzade hebin wan agehdar bikin!

Her di vê çarçoveyê de roja Duşemî 10`ê Sermawezê, radiyo “Peyam” a Îsra`îlê di raporekê de derheq krîza ewlehî ya rejîma Îranê gotibû ku, “Mucteba Xamineyî” ferman daye Wezîrê Îtila`atê, Fermandeyê Spaha Pasdaran û Fermandeyê Taya Îtila`atê û Ewlehiya Spaha Pasdaran, ku rêjeya wefadariya me`imûran bi rejîmê re bi awayekî hûr gengeşe bikin.
Bi giştî eva ku niha di nav berpirsên rejîmê de heye, awayek ji sergêjî û bêhêvîbûna ji navendên Ewlehiyê

## Sergotar

### Veqetiyan, bihevrebûn, heliyan

N: Kerîm Perwîzî

Deh salan piştî yekgirtina refên Partiya Demokrat li salên 1375`an a Rojî, û 14 sal berî niha di 15`ê Sermaweza 1385`an a Rojî de, carek din veqetiyan di nav refên vê partiya xwedî ezmûn û xebatkar de rû da, û nîgeraniyeke zêde li cem heval, alîgir û dilsojên Partiya Demokrat û xebata Rojhilata Kurdistanê çêkir.

Bi xweşî ve bas û diyalog û rewşa yekgirtina refên têkoşeran û refên Partiya Demokerat a Kurdistana Îranê, niha germ û gurrtir hatiye gorê, û hemû aliyek daxwazakarê vê yekê ne ku hindî zûtir ev mizgînî bê danê, ku cardin refên têkoşerên Demokrat li cem yek in, û birînên derbasbûyî hatine dermankirin.

Di dîroka 75 salan a xebata Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê de, çendîn carî veqetiyan di nav refên wê de rû daye, û cardin refên têkoşeran bûne yek û komî ser hev bûne, û eva, wê gotara rohn û zelal a me dibêje me, ku demokratbûn bûye pênaseyek ku li meşa xebat û têkoşîn û cangoriya dîrokî de bo rêvîngên wê rêyê maye, û her cure veqetiyaneke teşkîlatî nebûye sedema piştguhxistina nasname û veqetiyana ji pênaseyê, û lewma jî cardin basa yekgirtinê tê kirin, û cardin em ber bi pêşwaziya yekgirtinê ve diçin.

Lê dibe eva li cem me girîng be ku çawa mêzeyî yekgirtinê dikin? Gelo dema ku behsa yegirtinê ye, çi li nav Partiya Demokrat, çi yekgirtin di nav refên têkoşerên Kurd bi giştî, û yekgirtina Partiyên Kurd, yekgirtin li cem me ji çi pêk hatiye? Gelo bo yekgirtinê hewce ye em bêne helandin û cardin şikil bigrin, û di rastî de yekgirtin wateya heliyana reng û selîqê dide, û demekê em yekgirtinê bi tewaw dizanin, ku heliyan hatibe gorê?


Ji dîtingeheke wiha ve ku em behsa yekgirtina Kurd bikin, û em bixwazin hemû wekî hev bîr bikin û me hemûyan yek rengûrû hebe, hekî îmkana wê hebe, eva tenê faşîzmê li pey xwe tîne. Lê ne îmkana wê heye û ne jî me digihîne encamê. Belkî bîrkirineke wiha ne tenê îmkana wê nîne, belkî tenê û tenê veqetandineke din û ji hev belavbûna Kurdan li pey wê tê.

Piştî wan hemû ezmûnên ku Kurd bi giştî û nemaze Rojhilata Kurdistanê tê re derbaz bûne, hewce ye em cureyeke din mêzeyî yekgirtinê bikin, ku veqetandinek din jê şîn nebe, belkî hewce ye ku yekgirtî be, bi vê wateyê ku me li dora hev kom dike û pêkvebûna me diafirîne.

Di nav hizbeke yekgirtî ya Demokrat de bihevrebûn yanî parastina boêûnên kesî û teybetî yên me, lê di pêxema berjwendiyeke bilindtir de, û pêbendbûn bi soz û qewlên li hember rêkkevtinê de, ku ew yek hêzeke mezintir diafirîne bo ber bi pêşvebirina xebata neteweyeke zulimlêkirî û berxwedêr. Armanca me ya sereke divêt bihêzkirina xebata gel li dijî koloniyalîzmê be.

Li ser sêrêya veqetiyan, bihevrevbûn û heliyanê de, rasterêya bihevrebûnê hem berjewendiya me ya bilind dabîn dike, û hem jî kesayetiya tak û dîrokî a me bihêztir dike, û hêza xebata me bo lihemberderketina dagîrker zêdetir dike.

## Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ Mistefa Hicrî bi helkefta 16ê Sermawezê peyamek belav kir



**Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ "Mistefa Hicrî" bi helkefta 16ê Sermawezê roja "Kêmendamên PDKÎ" peyamek belav kir.**

Deqa peyamê wiha ye:

Kêmendamên Partiya Demokrat bi gorîkirina beşek ji leşê xwe, nirxeke giran pêşkêşê azadiya welat û gelê xwe kirine, ew şehîdên zindî yên rêya xebatê ne, çiraya rêya paşeroja rizgariya nivşa paşerojê ne.

Li roja Kêmendamên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê 16ê Sermawezê, slav, rêz û emegnasiya xwe pêşkêşê wan û tev kêmendamên rêya xebata Kurdistanê dikin.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê

Lêpirsyarê Giştî

"Mistefa Hicrî"

15`ê Sermawez a 1399`an a Rojî

5`ê Kanûna Pêşîn 2020`an

# Parvebûn, sedema windabûnê ye



N: Nûredîn Sofîzade

Îro em kurd di nav şerên cuda cuda de ne, xweragirî û ravestiyan di hember wan hemî pîlanên rengrengî de xebatê bo mirovên xebatkar çend qat dijwartir dike, lê hin kes hene wek di xewna mirinê de bin, wek ewê ku ne ba tê ne baran, haya wan lê nîne ku çi bi serê gelê wan de tê, û guh nadine derdorên xwe.

Ev cure kesane her bi wê hindê jî nasekînin, belkî gelek caran tevgera kurd sûçdar dizanin û basê razîbûna ji deshilat û dewletên dagîrker dikin, bi taybetî dema ku em dênekê bidine Rojhilatê Kurdistanê, mixabin zaf kesên wisa xuya dibin.

Rejîma dijî Kurd a Îslamî ya Îranê jî, destê xwe nav milê wan cure kesane dide û bi dijî netewa wan û tevgêra Kurd wan bikar tîne.
Yek ji şerên ku mixabin tevgera kurdî gelek xwe pêve mijûl dike û hêz û pitansiyelekî zaf jêre xerc dike, ew şere ye ku dujmin bi Kurdên îxanetkar re digel şoreşê dike.

Ew cure kesane jî dikarim bêjim çend deste ne
1– Kesên bi zanebûn kevtine nava tora îxanête û bi temamî xwe û îrada xwe dane destê dijmin û bi yekcarî pişta xwe dane gelê xwe û eva destê wan tê li dijî şoreşê dikin, û hekî gotî pira pişt serê xwe ve herifandine û rêka vegeryanê bo xwe nehêlane, ew cure kesanane hinde di nav îxanetê de bat bûne û heta enîşkê destê wan bi xwîna xortên Kurd sor bûye û bûne pêşqerewilê dijmin.

2– Kesên ku bi neçarî û nejdilê xwe kevtine dafka rejîmê, bi curekê kêşeyek hebûne û rejîmê ji derfetê mifah wergirtiye û kêşane aliyê xwe û ew kesane hatine girêdanê û bona rojderbaskirina xwe weke “siyhî leşker” di gel rejîmê de ne û renge çekdar jî bin.

3– Kesên ku li ber hejarî û nedarî û bêkariyê, tenê bona bidestveanîna hinek curên madî, weke perê mehane, xwe neçar dizanin û wisa dizanin ku eva rêkekî sanahiye bona tejîkirna timahiya malê dinê, rejîmê jî derfet ji nedarî û birsîtiya wan wergirtiye û li hember dana “hiqûqek”î mehane de wan bi kar tîne.

4– Ew para ji kesên ku li xizmeta dijmin de ne, para herî bi gef û cihê tirsê û netewefiroş in. Ew cure kesên îxanetkar bi hizr û ceste û gotin û pênûsa xwe, kevtine çepera dijmin û bi dijî netewa Kurd şerekî gelek dijwar a hizrî û derûnî encam didin. Ew kesan stratêjîstê dijmin in di nav dilê Kurdistanê de, ew cehdê dikin ku ne bi çekê, belk bi hizr û raman û hundir kar bo dijmin bikin, da ku şoreşa Kurdî cem netewa Kurd bibine jêr pirsyarê û ber çavê wan xirab bidine xuyakirin.

Di dîroka tevgera rizgarîxwaziya Kurd de, hertim derba herî giran wan cure kesan ji şoreşê dane û mixabin kartêkerî û bandora şerê wan yê hizrî û derûnî gelek ji çekên komkuj xedatir bûye. Wan bi nivîsînên xwe, bi gotinên xwe, bi lêdana jêsta rewşenbîriya xwe, mixabin gelek caran karîne bandorê dabinêne ser zaf kesên hizirsava yên nava civatgeha Kurdistanê.


Wan cure kesên îxanetkarê hizrî, berdewam cehd kirine dîmenekî xirab ji şoreşê nîşan bidin û sebebkarê bêparî û heta nebûna xizmetguzariyê di Kurdistanê de dane zanîn, û di hember de cehd kirine rûyekî milyaketane û xemxwarê Kurdan ji dijmin bidine kivşê.



5– Kesên bê helwêst (bêtefawt) di nava civatgehê de hene ku di ser wê bawerê ne ku hekî xwe di hember bûyeran kor û lal bikin, çawên xwe bigirin kesê kar bi wan re çinîne. Lê rejîma dijî Kurd û dagirker a Îranê guh nade wan kesan û berî hemî kesê, ew para ji civakê rastî asteng û pirsgirêkan dibin û bi curekê nekarîne bibine xwedî biryar û xwe berpirsyar nizanin beramber çi tiştekê de, bi awayekî dinê mirov dikare bêje ew cure kesane berî hemî kesê, xwe dixapînin, çimkî agirê dijmin û zilm û zordariya ser netewa me, kesê jev cuda nake û bê guman berî her kesê, ew cure kesên bê helwest rast zererê dibin.

Divê em berî her tiştî di zanabûna rastiya xwe de bin û rewşa dijminê xwe baş bizanin. Ew şerê ku li hember gelê me berdewam e, ne şerê bi dijî parek ji gelê me ye, ne şerê tenê bi dijî şoreşvana ye, belkî şerê wan bi dijî hemî gelê kurd e û li cem dijminan baş û xirabê Kurdan çinîne, heta cem dijmin çi cudahiyek di navbera şoreşvanan û kesên xapandî ku kevtine nava tora îxanetê wate (Caş) in jî çinîne, dijmin wan bi dijî netewa wan bikar tîne û ji kîjan alî xisarmend be û yan bête kuştin, cem dijmin çi cudahiyek nîne û Kurdekê xisar dîtiye yan hatiye kuştin.

Lewra divê gelê me carek bo hemî hertimî hem xwe nas bike, hem dijminê xwe nas bike, divê ji bê helwestî û bê tefawtiyê derkevin, cem dijmin Kurdê baş û xirab çi cudahiyek çinîne û Kurd her Kurd e, lewma em Kurd jî divê aliyê kêm ji dijminê xwe fêr bin û bêne ser wê baweriyê ku dijmin baş û dijminê xirab çi cudahiyek nîne û dijmin her dijmin e, ew dijminê ku me jêveye baştir e, rast wê meselê tîne bîra mirov ku hemen dijmin e ku dixwaze pê pembo serê Kurdan bibire.



# Yekîtiya Partiya Demokrat, hewcehiyek bona Îranê



**N: Mesûd Mihemed, Beyrût**

**Wergêr ji Erebî bo Kurdî: Hêriş Palanî**

**Berhemanîn: Kurdistan**

Li bûyer û pêşhatên lezgîn û bi nişkê ve li derheq dosyeya navikî ya Îranê, Wezareta Berevanî ya Îranê ragihandibû ku pisporê navkî yê Îranê "Muhsin Fexrîzade" hatiye kuştin. Navendên ewlehiyê yên welatên Erebî "Muhsin Fexrîzade" wekî berpirsê projeyên nihênî û veşartî yê navikiya Îranê binav dikin, li derheq wê bûyera girîng û nû, renge cihê wê pirsyarê hebe, ka rêberên tevgera Kurd li Rojhilatê Kurdistanê dê çi helwestek hebin û dê bi çi awayekî mêzeyê wê bûyera girîng bikin? Nûnerê wan nivîsan bi salan e ku bêrawestan bona yekgirtina refên tevgera Kurd li Rojhilatê Kurdistanê hewlên micid didin. Lê mixabin heta niha bi sedema pirsgirêkên cuda yên hundirî û derveyî di navbera Kurdan de hewlên me negihîştine armancê. Renge zêderewî nebe ku em hizir bikin û bêjin ku hewlên me rohn bûne û tenê sedema wan cudatiyan heta niha bi awayekî berçav vedigere ser helqeya cudatiya rêberên wan tevgerên mafxwaz. Di wir de wekî her Kurdekî dilsoz yê wê tevgerê, ji xwe re dibînim ku bi dengekî bilind û micid wê pirsyarê bikim ku, di rastiyê de ma dema yekîtiya refên tevgera Kurdistanê û nemaze refên Partiya Demokrat wekî kevnartirîn û cudabîrtirên Partiya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê nehatiye?

Bo çî li despêk û zûtir ji hemûyan, Yekitiya Demokrat?

Bi wê sedemê Partiya Demokrat, ku xelkê Kurdistanê bi rastî çavnhêrî ji rêberîkirin û berxwedana wê Partiyê hene. Di wê qonaxê de ku rejîma Îslamî ya Îranê zêdetir ji her demekî, di bin givaş û dorpêçên cuda yên kavilkerên aborî de ye, tevî îdi`a û gefên çewt yên rejîma Îranê li dijî Amerîka û Îsraîlê, rejîma Îranê bi awayê tirsîn û xweparêziyê hewl dide ku tûşî şerekî nebe ku nekare êdî bi hêsanî lê derbas be. Niha




rejîma Îranê di talçixa batlaqa Sûriyê de maye, bi salan e ku di Lubnanê de bûye beşek ji krîzên bêçareser, ew tedaxul bûne sedema bargiraniyeke zêdetir li ser milê aboriya îflaskirî ya Îranê û rejîmê ber bi şikestên kûrtir ve dibe. Rejîma Îranê niha ji her demekî zêdetir bi tenê maye, bilî rejîmên rûreş a Sûriye û Vênêzoêlayê û hin caran bi sedema berjewindiyan Rûsiye û Çîn ev jî ji rû ve, bilî wan kijan alî û welateke demokrasîxwaz û demokrat bi micidî piştevaniya rejîma Îranê dike û digel wê hevdeng e?"

Her wekî dizanin, civatgeha cîhanî jî ji aliyê siyasî ve, Îranê bi welatekî serkêş nas dike û ji aliyê aborî ve jî lawaz û bê bandor e. Em tev dizanin ku ew rejîme heyameke zêde ye ku rewatiya xwe û piştevaniya xelkê ji dest daye. Siyaset û bernameyên Îranê li ser pêgeha "alozîxistin û afirandina pirsgirêkan di deverê de bona xwesepandin û rewatîdan bi hebûna xwe bo xelkên dinê daniye", ku ew tedaxul û afirandina aloziyan bi berdewamî rexne û nerazîbûnên navnetewî li pey xwe anîne. Welatên cîhanê bi rohnî bo rejîma Îranê dane xuya ku ti kes êdî li ser reftarên Îranê bêdeng namîne û êdî nikare serkêşiyên xwe bidomîne, lewma dorpêçên aborî, siyasî û leşkerî yên cuda li dijî Îranê pejirandine.

Hêj roh nîne ka rejîma Îranê dê bikare bo hayamekî dirêj taba ew hinde givaş û gefan bîne û nehirife an na. Meger bi sedema givaşên aborî û krîzên hundirî ji afirandina fitneyan û tedaxul li deverê dest hilgire, ji Sûriyê derkeve, di karûbarê hundirê Îraqê de tedaxulê neke û ji Yemenê paşekêşiyê bike û li Lubnanê şerxwaziyên xwe bi dawî bîne, li ser asta cîhanê projeyên xwe yên navkî bi tewawî bi dawî bîne û bernameya mûşekiya xwe ragire û bibe welatekî asayî û xwediyê seha berpirsayetî û girêdayî yasayên navnetewî.

Di wê rewşê de, tevgera Kurdistanê jî hewcehî bi nêrîneke nû û danûsitandinan û guherîneke bingehîn û realîstî heye; Hewcehî bi dîtineke nû li ser binyata rastiyan û yekgirtinê heye û dibe digel hev bona darîştina bernameyeke nû di hewla hilgirtina pêngavan de bin, heta digel opozîsiyona Îranê bona herifandindina rejîma niha û bidestveanîna mafê Kurd û têgihîştandina daxwazên rewa yên gelê Kurd di çarçoveya "sîstemeke Demokratîk û Federal"de li Îranê danûstandinan bikin û bigehin lihevhatineke dawî.

Xelkê Kurdistanê çavnihêrî ji Partiya Demokrat hene ku digel hev bibin bi pêşrevê hevgirtina di navbera refên Demokrat de; herdu aliyên Partiya Demokrat xwediyê dîrokeke hevpar ya rêberatiyê ne; Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Ebdulrehman Qasimlo û Dr. Sadiq Şerefkendî, rêberên bê mînak in. Herdu aliyên Demokrat erkdar in ku bersiveke erênî û dilxweşker bi xelkê yekgirtinxwazê Kurdistanê re bidin. Ya herî girîng, ew partî dibe yekgirtî, pêgeha dîrokiya xwe car din bi dest xwe ve bînin û di rêya desteberkirina silogana bi nav û deng û xwediyê pêgeh li nav tev xelkê Îranê, siloganek ku ji aliyê Qasimloyê nemir ve hatibû dan û berhema hizra wî bû, bo silogana "Demokrasî bo Îranê" xebatê bikin.

Şehîd "Dr. Qasimlo" dizanî ku paşeroja Îranê bi "Demokrasî li Îran"ê ve girêdayî ye; xelkê Îranê çavnihêreke zêde ji "Partiya Qasimlo" hene; Mihabad jî çavnihêr e ku ew partiya, wê xerîteya têkoşîna xurt bona paşerojeke rohn bo Kurd di Îranê de bizivirîne.
Di bin alaya azadî û demokrasiyê de. Gelo rêberên Partiyê dengê yekîtîxwaziya xelkê Kurdistanê dê dibihîzin û alaya yekîtiyê dê bilind bikin?

# Îran wek gefek bo ewlehiya Îsra`îlê û berevaniya rewa a Îsra`îlê



N: Elî Munezemî



Pêwendiya navbera Îsraîl û Îranê di heyamê avabûna Îsraîl di 1948`an heya îro rojê, nizmî û bilindiyên zaf bi xwe ve dîtine. Îsraîl di 1949an de li serdemê paşayetiya Muhemmed Riza Pelewî ji aliyê dewleta Muhemed Sa`id ve bi awayek dufakto (en. de facto) ji aliyê Îranê ve bi fermiî hate nasîn. Lê dîsa li serdema dewleta Mihemed Musediq di 1951an de Îranê konsolê xwe li Îsraîlê vekişand û konsolxaneya Îsraîlê jî li Tehranê daxit.

Piştî kûditaya dijî dewleta Musediq, carek din pêwendiyên navbera Îsraîl û Îranê li ser bingeha berjewendiyên dualiyane germ û gur bû û heya dema herifîna rejîma paşayetiyê li Îranê di 1979an de herwisa bi germ û gurî dom kir. Piştî nemana rejîma paşayetiyê û bi desthilatgihiştina rejîma Îslamî a Xumeynîstî, balyozxaneya Îsraîlê li Tehranê hate dagîrkirin û pêwendiyên eşkere di navbera her du aliyan de dawî pêhat.

Guhertina pêwendiyên sar di navbera wan du welatan de bi şerê gerim û berfireh, piştî xilasbûna şerê navbera Îran û Îraqê dest pêkir. Eva jî li demekê serîhilda ku Îranê bingeha siyaseta xwe ya fermî li ser dijberiya tevî Îsraîl û li holê rakirina yekcarekî ya wî welatî darişt û Rojhelata Navîn xistiye rewşeke ducemserî ku li hêlekê Îran û hevalbendên xwe û li hêla din jî Îsraîl hebû. Di rewşeke hanekî de Îranê cehd kir ku rêberiya welatên Musilman bêxe destê xwe û armancên xwe di bin siya dijberiya tevî Îsraîl de veşêre. Lê xêncî hindek girûpên terorîst, kes nekete pey wan pilanên Îranê de. Ji ber ku welatên erebî gefa Îranê li ser xwe bi tehlûketir dizanin heya tehlûkeya Îsraîlê.

Her li ser bingeha wê yekê ye jî xêncî rejîma Esed û hikûmeta ferqegera ya Bexdayê û terorîstên Lubnanê û Yemenê nebin, çi welatek Erebî li pey pilanê Îranê neketin. Wan welatan baş dizanin ku gef û tehlûkeyên ewlehî di navçeyek wek ya Rojhelata Navîn de yê her di wê herêmê de sinordar bimîne û ew yeka jî dikare kartêkerî li ser ewlehiya gel û welatê wan bi awayekê nerênî hebe.

Di hember wan pilanên Îranê de, Îsraîlê karî bi şêweyek jîrane bi hilkişandina şiyan û hêza xwe, ewlehiya xwe biparêze. Ew li hêlekê bûne hevalbendê welatên zilhêz wek DYA, karîn dijminatiya tev Ereban bi dostiniyê biguherin û li ser bingeha pêkvegêdayîbûnê dualiyane, pêwendiyên xwe tevî welatên Erebî asayî bikin. Wan di hemû sektorên ewlekariyê, an ku çekdarî, siyasyî, civakî, aborî û jîngehî bo jixwedûrkirina gefên Îranê mifah vergirt.

Rejîma Xumêynî ku her bi zorê Îsraîl kire dijminê xwe û bi şerfiroşiya xwe çi rêyek bo wan nehêla, bûye sedem ku Îsraîl jî di hizra parastina xwe de cehd û têkoşînek mezin dest pêbike. Wan karî torên sîxurî ên xurt di hundirê Îranê de pêk bînin û çavdêriya bernameyên çekdarî û terorîstî yên Îranê bikin û bo têkdana wan pîlanan jî li çi derfeteke derbaz nebin. Îsraîl û hemû cîhana xwedî şaristaniyet, Îranê bi dijminê xwe yê pileyek dihesibînin û pêşkevtina Îranê di warê meyandina uraniyomê bo gihîştin bi çekên etomî wek gef li ser mirovahiyê dizanin û cehd dikin ku pêşiya bernameyên mûşekî û etomî ên Îranê bigrin. Bo gihîştin bi wê armancê, hem li emrazên siyasî, sabotaj û torên sîxurî û zerbelêdanên çekdarane bo pêşgirtin li terorîzma hikûmetî a Îranê mifah wergirin û hem li derve û hem jî li hundirê Îranê de mohre û damezraweyên Îranî dikin armanca xwe.

Hikûmeta Îsraîl li aliyekê rêka hevkariyên locîstîkî yên Îranê bo hevkariya girûpên terorîstî wek Hemas û Hzibullahê lê qut dike û nahêle çek bigihîjin wan û ji aliyek din jî li Sûriyê çekdarên Spaha Quds a Îranê dike armanca êrîşên balafir û balafirên bêpîlot ên xwe û moledanê nadin ku Îran û terorîstên ser bi Îranê bo demek kurt be jî, nefesek rihet bikşînin.

Her di heyva Novemberê ya îsal de berpirsyar û zanayek Îranî bi navê Muhsin Fexrîzade li Tehranê hate kuştin ku heyamek beriya niha gava ku dezgehê sîxurî a Îsraîlê karî belgeyên bernameyên etomî yên Îranê li Tehranê birevîne, navê wî ji aliyê Serokwezîrê Îsraîl ve Binyamîn Neteniyaho, hatibû eşkere kirin û dabû zanîn ku Muhsin Fexrîzade hêla çekdariya bernameya etomî bi rê ve dibe. Ber hindê jî hemû aliyekê bo kuştina Fexrîzade, tiliya xwe dirêjî Mossadê kirin. Lê ew kuştina ji aliyê her girûp yan aliyekê ve hatibe kirin, armanca wê têkdana pilangihîştina Îranê bi çekên komkuj yên etomî ye û dibe wek kiryarek berevankarane were dîtin û li berjewendiya mirovahiyê û ewlehiya Rojhelata Navîn û cîhanê de were dîtin.

Hikûmeta Îsraîlê berevajî rejîma terorîstî a Îslam î ya Xumêynîstî, ne xelkê Îranê dijminê xwe nizane, belkî bi dehan caran karbistên Îsraîlê anîne ziman ku hisaba xelkê û rejîmê di Îranê de du tiştê li hev cuda ne û hêvîxwaz in ku rojek were ku xelkê herdu welatan, bi nemana rejîma tevahîxwaza Îslamî, bibin xwediyê pêwediyên germ û dostaniyek li ser xîm û bingeha berjewendiyên hevpar ava bikin.



## Hevpeyvînek digel sînemakar “Gabar Çolî” li derheq karê sînemavaniya Kurdî li derveyê welat



**H: Bozê Sîna**

**P:** Gabar Çolî tu dikarî xwe bidî naskirin?

**B:** Spas û pêzanîn bo wê derfetê. Navê min Gabar e. Ez li malbatek welatparêz li bajarê Urmiyê hatime dinê. Wek gelek şoreşgêrên Rojhelatê Kurdistanê ez jî tevlî refên PDKÎ bûm.

Piştî çend sal pêşmergayetiyê ez wekî penaber awareyê welatê Kanada bûm.

Bo zêde nasandin û pêşxistina pirsa Kurd min sînema weke rêbazek nû girte ber xwe.

**P:** Tu dikarî basa kar û xebata xwe ya sînemayê bikî?

**B:** Piştî qetandina xwendingeha fîlmê, min dest bi çêkirina kurtefîlman kir û heta wê gavê min 6 kurtefîlm çêkirine. 4 kurtefîlmên min xelatên navnetewî birîne û di hindek welatên Ewropî û bakurê Amrîkayê de pişikdarê pêşbirkêya fîlma bûne.

**P:** Tu kesek pêşmerge û kurdek welatparêz î, çima zimanê hemû berhemê te bi Înglîzî ne?

**B:** Ez û hemû Kurd serhata bindestiya gelê me dizanin. Min kerestey a sînema û zimanê Înglîzî wekî pira hizrî bi kar aniye ku bi lezgînî ez bikaribim derbasî gelek erda bim û pirsa kurd di rojevê de zindî bêhlim. Pêka derfetên ber dest li welatê Kanada û bi karanîna teknolojiyê min kariye serhata komkojiya Kurdan li her derê dinyayê nîşan bidim.

**P:** Tu dikarî basê fîlma xwe ya herî dawiyê ya bi navê “KURDISH BBQ” ji mera bikî?

**B:** “KURDISH BBQ” an ku “Kebaba Kurdî”, serhata kurdek Êzidî di girtîgeha “DAISH”ê de ye û hazir nîne bibe Misilman.

Min xwest dinya bizane “DAISH” kê ye û bizanin pêşmerge, gerîla û şervanên Kurdan bi çi lehengiyekê mirovatî parastine.

Bo serxwebûna welatê Kurdistanê min rêbaza pêşmerge girte ber xwe û wê gavê jî ez bi heyecanek mezin ve wek pêşmerge dijîm û her derê dinyayê ez çeperê serbestiya gelê me dibînim. Min ser mirinê da banz daye û ez bi gef û êrîşa li xebatê dil sar nabim.


bibînim.

**P:** Kê bandor ser karê te heye?

**B:** Min Mezintirîn bandor li şervanê serxwebûna Kurdistnê wergirtiye. Ez serê rêz ber heybeta girtîyên azadiyê û şervanê gelê me li sere çîya ditewînim. Ez we silav dikem, hebûna we germahiyê dide dilê min.

Ezê bi saya serê pêşmergên gelê xwe yên bi vêr û bi hez






**P:** Wek tê zanîn alîgiriên “DAISH”ê gelek gef li te xwarine û gefa kuştina te xwarine. Çima li te aciz in?

**B:** Bi kurtefîlma “KURDISH BBQ” min rûyê wan yê qirêj nîşanê dinyayê da û rastiya wan gelek zelal bi zimanek sakar got. Bi rêya torên civakî ve fîlma min li gelek welatên dinyayê ve hatiye dîtin.

**P:** Tu dixwazî bi wê fîlma xwe çi bêjî, çima te ew film çêkir?

**B:** Min bi wan 30 salan çend komkujiyên Kurdan dîtine. Bêdengî li hember komkujiya Kurdan îxanet bi mirovayetiyê ye.

Ez erkê xwe yê mirovî dizanim ku li Kurdbûnê xwedî derkevim.


**P:** Tu sînemaya Kurdî çawa dinirxînî?


**B:** Me kurdan, fîlmê Kurdî hene, me fîlm li ser mijara Kurd jî hene, lê me sînemaya Kurdî nîne ku di sînemaya Kurdî de berhemê nêrîna dewlata Kurdî be. Wek hemû Kurdan ez di demek nêzîk de dixwazim dewleta Kurdistanê û sînemaya Kurdî

kelatiya dilê Kurdan bilind hewar bikim.

**P:** Em li kîderê dikarin berhemên te bibînin?

**B:** Ser tora înternetê bi #Gabarfilm hûn dikarin karê min bibînin yan jî li ser Facebookê rûpela min ya fîlma ya bi navê “GabarFilm” dikrin kurtefîlmên min bibînin.





## Nerîna Lîderan



**“Donald Trump”:**
**“Demokrat dê milyard Dolaran bidine rejîma Îranê”.**



**“Joe Biden”:**

**“Em îznê nadine Îranê destê wê bigihe çeka navkî”.**



**“Heiko Maas”:**

**“Rêkkevtina bercamê êdî bi kar nayê”.**




**“Elî Xamineyî”:**

**“Dibe palavtinek di navendên ewlehiyê de bê kirin”.**

# Civakên Ewropî ber bi pirrengbûnê diçin!



N: Eskender Ceiferî




Di heyamên derbasbûyî de li Almanyayê toreke ragihandinî bi piştevaniya dewletê hate ragihandin ku tê de zimanê Kurdî jî li kêleka zimanên hin neteweyên din bicih e. Navê wê, Tora ragihandinê ya pirrengî ye!

Vê torê di daxuyaniya xwe de ji xeynî zimanê Almanî, cih daye pênc zimanan ku Fransî, Erebî, Ingilîzî, Kurdî û Potrogalî li xwe digire.

Di daxuyaniya destpêkê ya karên vê torê de hatiye: Em çalakvanên ragihandinê bi pêşîneya koçberî yan jî penaberiyê ne û hertim hest bi rastgirî yan jî nijadperestî û newekheviyê dikin. Li ser me gelek tê axaftin lê belê ne bi me re. Em xelkê bi pirojeyên ragihandinî re li hev girê didin û dengê xwe hildidin û destêwerdanê dikin. Em bi perwerdekirin û lihevguhertina nerînan, hevdu xurt dikin. Emê bikarin ji bo her kesî toreke cûrbicûr û pirreng biafirînin.

Girîngiya vê torê ji bo Kurdan ev e ku zimanê Kurdî jî, li kêleke hin zimanan cih girtiye ku xwedî dewlet in û di asta navdewletî de jî têne bikaranîn.

Di beşeke din ji Em dixwazin bi hêza ragihandinê, bêne guhdarîkirin û xwe têgihiştî bikin û meyl û heza kesên din jî, ji bo vî karî zêde bikin. Em xwe ji bo tevlîbûn bo guhertinên demdirêj û berfirehkirina ragihandinê, berpirsyar dibînin. Armanca me, civakeke vekirî, pirreng û mayînde ye. Tora ragihandinê ya pirrengî, tora me ya nû ye ku ne tenê girêdayî çandekê ye. Em ragihandinkarên ji welatên cuda, zimanên cuda û dîrok û pêşîneyên cuda ne.

Ew dixwazin civakeke pirreng li vir pêk bînin. Lê ji ber ku ev cara yekemîn e saziyek ku bi piştevaniya dewletê tê avakirin û li zimanê Kurdî jî xwedî derdiekve, Kurdên Almanyayê jî pêşwaziya wê dikin. Vê torê di berdewamiya daxuyaniyê de ragihandiye ku em dixwazin jiyana xwe ya dilxwaz nîşan bidin. Em her tişta ku bandorê dike ser me, dikin raport û dîtin. Em nerînên nû derbasî nav ragihandina Almanî dikin. Em dixwazin ji bo pêkanîna gotûbêjan li ser mijara koçberî û penaberiyê alîkar bin ji ber ku ev mijar, pêwendîdarî me ye jî. Di van bernameyan de ku em çê dikin, em li ser mijarên siyasî û civakî li Almanyayê bo cîgir û altêrnatîvên cuda diaxivin. Gelek ji wan mijaran, derbarê me ne. Lê belê em xwe di penaberbûnê de yan jî tenê bi tiştên girêdayî civaka xwe sînordar nakin; Em helwestên xwe tînin ziman lê em dixwazin nîşan bidin ku em kî ne! Lewma jî serpêhatiyên cuda, bandorên çandî û herwisa nûçeyên derbarê rewşa niha jî, ji me re girîng in. Ew jî nîşan dide ku pirrengiya nîştimana her kesî û girêdanên wê, dikare pêwendiyan navbera dunyaya cuda ya her yek ji me pêk bîne û sînoran jî derbas bike. Em dixwazin ew tiştên ku em bi xwe re tînin û hebûna me, wek xwe, bên pejirandin.

Erê, rast e û Ewrûpî dizanin êdî Kurd bûne beşek ji rastiya Rojhilata Navîn. Lewma jî ew Kurdan û zimanê wan, derbasî nav pirojeyên bi vî rengî dikin û dibêjin pirrengiya pêşîneya me, me derbasî nav rewşekê dike ku bi nerîneke cîhanî, lêkolînê li ser encamên niha, piroseya koçberî û penaberiyê û herwisa stratejiyên siyasî û netewî bikin. Û bikariin karên perwerdehiyê bikin. Me bi ekterên saziyên penaberan û hinek saziyên din ên civakî re pêwendiyeke baş heye ku piştevaniya me dikin. Em vê torê weke odeyek ji bo hemû mirovan jî binav dikin ku dixwazin ezmûna xwe li ser kiryarên newekhevî parve bikin bêy ku rastî êrîşê bên yan jî li ser kesatiya xwe biaxivin.

Belkî wek çawan faşîstên Tirk dijatiya danînna zimanê Kurdî ji bo Facebook û Google jî kiribûn, dijatiya vê jî bikin. Lê van saziyan biryara xwe standine û di karên xwe de jî, ji bo zimanê Kurdî berdewam in. Ew dibêjin, bi pirrengiya mirovan û pirojeyên bi vî rengî, em xwe û hevdu bihêz û xurt dikin û rê didin ew mijarên me zêdetir li ber dest bin. Malpera me ya hevpar bi navê “Colourful Voices” vê derfetê çê dike ku wan naverokan ne tenê li bajarên xwe, lê belê li tevahiya Almanyayê û li derve jî belav bikin. Lewma em dixwazin derbasî nav ragihandina Almanî bibin û ji bo mayîndekirina wan mijaran li cem ragihandina Almanî alîkar bin.

Dawiya daxuyaniyê jî, wan behsa perwerdekirina rojnamegeran kiriye û dibêjin, di riya vê torê re, em dikarin pêwîstiyên têknîkî, madî û rêkxistinî pêk bînin ji bo ku bi pêkhateyên cuda yên rojnamegeriyê hem hevdu perwerde bikin û hem jî bêne perwerdekirin. Bi vî awayî jî wê bi pirrengiya reftaran, karên me yên hevpar, hevbendiya me û lihevguhertina nerînan bi awayekî giştgir bihêz û xurt bibin.

# "Joe Biden" û qeyrana Sûriyê



N: Ebdulazîz Qasim

Heta niha ne xuya ye ku rêveberiya "Joe Biden" wê çawa serederiyê ligel krîzên Rojhilata Navîn bike, hemû şirovekarên siyasî çavrê vê yekê ne ku "Biden" wê bi awayekî cuda ji siyaseta "Trump" serederiyê bike, bi taybetî li Sûriyê, ku dibe Amerîka bi roleke kartêker rabe û guhertineke mezin bêxe di siyaseta xwe de, û derbarê vê yekê, Enstîtuya (Middle East Institute -MEI), berî çend rojan di raporteke xwe de diyar kiribû ku Amerîka wê heman siyaseta berê di derheqa dosiyeya Sûriyê de pêrew bike, û cudahiya herî mezin di navbera siyaseta "Trump" û "Biden" de, ku "Biden" wê siyaseteke bi terazû û hevsengî û neliv bicih bîne, berevajî siyseta Trump ya nerehet û bêserûber.

Ji aliyekê din, rojnamenivîsa navdar "Heba Al-Qudsî", rêvebera nivîsîngeha rojnama "Al-sharq Al-Awsat" li "Washington", gotarek di 02.12.2020-an de belav kir û xuya kir ku nûnerê taybet yê berê yê rêveberiya Trump li Sûriyê, "James Jeffrey", bi rêya têlefonê rewşa herî dawî ya siyasî û ewlehiyê li Sûriyê, û rola leşkerî ya Amerîkî li Sûriyê û Îraqê ligel tîma serokê "Joe Biden" şirove û gengeşe kir, û diyar kir ku niha herî kêm 600 leşkerên Amerîkî li Sûriyê dimînin.

Herwisa nûnerê taybetî yê Amerîka bo Sûrîyê yê nû, "Jules Rayburn" di prês-konferanseke çapemeniyê de li ser bernema "Zoom" di dawiya serdana xwe de ya li Qahîre di bersiva pirseke rojnama "Al-Sharq Al-Awsat" de got ku Amerîka sê armancên serekî li Sûriyê hene, ya yekem têkbirina rêxistina "ISIS" ye, ya duyem qewitandina milîşên Îranî ji Sûrîyê ne, û ya sêyem jî pêkanîna çareseriyeke siyasî ye li Sûriyê li gorî biryarên Netewên Yekbûyî.

Aliyên siyasî wisa texmîn dikin ku serok "Biden" û wezîrê wî yê derve, "Anthony Blinken", wê bixebitin ji bo serrastkirina hin siyasetên şaş yên rêveberiya Obama yan bicihkirina hin tiştên ku Obama nekariye bike, hevdem ku "Biden" di dema kampanyaya xwe ya hilbijartinê de gotibû ku biryara Trump ya li ser vekişandina hêzên Amerîkî ji Sûriyê têkçûnek bû, û bal kişandibû li ser girîngiya piştgiriya Kurdên Sûriyê.

Nûnerê Amerîkî got: "Îran bi armanca ku bibe gef li ser Îsraîl û deverê, hewl dide ku bingehek stratejîk li Sûriyê dirust bike, lê ew sernekevt wekî ku Qasim Sulêmanî dixwest, ku rastî berxwedana leşkerî ya welatên cîran, û dorpêçên aborî û siyasî û givaştên Amerîkî hat, û da zanîn ku"ev givaştin dê berdewam bimînin, û civaka navnetewî û dewletên herêmê teqez in li ser ku nehêlin Îran armancên xwe bicih bîne, û nehêlin "Hizbullah" ji bo têkdana aramiya herêmê, bingekên leşkerî li Sûriyê dirust bike».

"Jules Rayburn" derbarê rola Tirkiyê got ku "ti rêkkeftin di navbera me de li ser her tiştî nîne, lê herdem em rêyên danûstendinê dibînin", û piştrast kir ku piştî çareserkirina krîza Sûriyê, divê hemû hêzên biyanî, yekser ji Sûriyê derkevin", û got ku Amerîka şandina çeteyên opozisyona Sûrî bo derveyî Sûriyê red dike.





"Jules Rayburn" tekezî li ser rola Misrê bo çareserkirina krîza Sûriyê kir, hevdem ku Misr û Erebistana Si'ûdiyê û Îmarat di hewlên berdewam de ne ji bo lawazakirina pêgeha grûpa Îxwan Mislimîn û opozisyona alîgira Tirkiyê "Îtîlafa Sûrî", herwiha ku tawanên artêşa Tirkiyê û çeteyên wê ji aliyê gelek saziyên mafên mirovî ve têne dokumêntkirin û gelek daxwaz hene ji bo xistina "Îtîlafê" û artêşa wê ya naskirî bi navê "artêşa nîştimaniya Sûrî" di nav lîsta terorîzmê de bi gunehbariya encamdana tawanên şer û tawanên dijemirovî li dijî miletê kurd li Efrîn û Girêspî û Serêkaniyê û dizîna dermal û samanên welatiyên kurd û talankirina şûnwarên dîrokî yên herêma Efrînê.

## Welatiyek Merîwanî bi 6 meh girtîgehê hate cezadan

**Di çend rojên derbasbûyî de welatiyekî Kurd yê bi navê “Xîret Perwaze” temen 30 salî kurê Rehman xelkê gundê “Nê”yê ser bi bajarê Merîwanê ji aliyê dadgeha Înqilab a wî bajarî bi 6 meh girtîgehê hate cezadan.**

Dadgehê ew welatiyê Kurd bi tohmeta “hevkarî digel yek ji partên Kurdî yên opozîsyona hikûmeta Îranê” tohmetbar kir.

Ew welatî ji derheq cezaya ku bi ser wî de hatiye sepandin ji aliyê dadgeha înqilaba bajarê Merîwanê, nerazîtiya xwe nîşan da û dosiyeya wî bo pêdaçûnê bo dadgeha



pêdaçnê hate şandin.

Roja Duşemî 19ê Cozerdanê ew welatiyê Kurd piştî gazî kirina bo îdareya Ît’ilatê û dawiya meha Puşperê piştî dawî hatina heyamê jêpirsîna wî bi danana barimteyê bi awayekî demkî hate berdanê.

## Jineke ciwan ji aliyê birayên xwe ve û bi tawana “namûsî” hate kuştin

**Roja Yekşemî 9ê Sermawezê, jineke ciwan ya bi navê “Sergul Hebîbî” temen 31 sale û xelkê gundê “Sûrwaz”ê yê bexşa navendî ya bajarê Sineyê, ji aliyê birayên xwe ve hate kuştin.**


Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, ew jina ciwan, xêzandar bûye û bi sedema pirsgrikên namûsî ji aliyê birayên xwe ve hatiye kuştin.

Herwisa wê çavkaniyê got: “Sergul Hebîbî bi sedema pêwendiya hezkirin digel kesekî din, ji aliyê sê birayên xwe ve hatiye hincîhincîkirin”.

Çavkaniya agehdar ya Kurdpayê li derheq vê bûyerê ragihand: “Termê wê jina ciwan roja derbasbûyî li goristana “Bihişta Mihemedî” û bi beşdariya 5 heta 6 kesan teslîmê axê kirin.

Ew jina temen 31 sal li bajarê Sineyê bû qurbaniyê pirsgrikên jinkujî û heya niha bikujên wê jinê xwe radestî polîsan nekirine.

Li gor madeya 220 a yasaya bingehîn ya Îranê, “di demekê de bav an bapîrê wê/wî- ji aliyê bavkê ve- zarokê xwe bikuje nayê îdamkirin û




bi dana diyeya kesê ku hatî kuştin, bikuj bi awayekî teizîrî tê cezadan.

## Daristanên Kurdistanê bi bêdengî têne birrîn

**Darên daristanên Kurdistanê di bêdengiya berpirsên rejîmê li parêzgeha Urmiyê têne birîn û talankirin û jinavbirîna xwzaya Kurdistanê ji aliyê kesên nizim û karbistesên rejîma Îranê ve têne kirin.**

Pêka vîdiyoyên ku di nav torên civakî de hatine belavkirin, daristanên derdora bajarê “Pîranşar”ê li parêzgeha Urmiyê têne birîn û bo derveyê wê parêzgeghê têne şandin û tireyliyên barhilgir yên wan daran li ti seytere û ji aliyê ti berpirsekî rejîmê



ve nayêne rawestandin û bi hêsanî têne veguhastin.

Daristanê Kurdistanê ku bi piranî darên berûyan li xwe digre bi awayekî sîstematîk ji aliyê karbidestên rejîmê û herwisa kesên nizim ku rejîma Îranê piştevaniya wan dike, têne birîn û bo cihên din heta derveyê welat bi awayê qaçax têne firotin.

Ticareta daran bo derveyê Îranê bi taybet bo welatên derdora kendavê ji aliyê karbidestên rejîmê ve tê kirin ku pereyekî zêde bi dest xwe ve tînin û ji aliyekî dinê ve derbê bi xwezaya Kurdistanê didin ku rejîma Îranê li vê derheqê de bêdeng e.

Heyamekî dirêj e ku xweza û surûşta kurdistanê di bin êrîşên talan û şewitandinan ji aliyê rejîma Îranê ve ye û bi hêcetên cor bi cor, daristan û xwezaya Kurdistanê ji nav dibin, hewceye gelê Kurd ji darayiya netewiya xwe xwedî derkeve û wê zêdetir biparêze.

## Lîstikvanekî Kurd ji bo fîlmek Hollywoodê hat hilbijartin

**Lîstikvanê Kurd Erdal Ayna ji bo fîlmek Hollywoodê weke lîstikvan hate bijartin. Erdal Ayna 15 salin karê lîstikvanîyê dike û wî heta niha bi dehan rêzefîlmên Kurdî û Tirkî de lîsitikvanî kirîye. Erdal Ayna dê di fîlmê de weke endamê mafyayê rol bigre. Ew fîlmeke hevpar a Amerîka û Tirkiyê ye dê dawîya 2020an li Trikiyê û Amerîka tomarkirina dîmenan dest pê bike.**



Erdal Ayna şanogerek Kurd e ji gundê Taşdirek ê bi ser Amedê ye. Wî heta niha bi dehan di rêzefîlmên kurdî û tirkî û herwiha di fîlmên metraj dirêj de weke lîstikvan cîh girtîye û vê carê jî bo fîlmek hevpar a Amerîka û Tirkiyê peyman bi Amerîkiyan re îmze kirîye û berê wî li Hollwoodê ye.

Fîlma ku derhêneriya wê Darryl D.Johnson bike, dîmenên wê di dawîya 2020an de li Amerîka û Tirkîyê bêne tomarkirin.

Lîstikvan Erdal Ayna ji Rûdawê re got: “Vê nexweşiyê hemû karên me betal kir.Tam di vê rewşê de min got êdî her tişt qediya. Ev bû heşt meh em bê dik bûn hema bêje wek em nebin. Tam jî di rewşek wisa de bi hatina teklîfek navnetewî ez gelek kêfxweş bûm.Ez dixwazim di vê projeyê de ji bo lîstikvanên Kurd û ji bo hunera Kurd bibim mînak ku dinya nas bike.”

Senaryoya fîlmê li ser macerayên komek muzîkjenên repê yên ku ji Amerîkayê çûne Tirkiyê ye. Lîstikvanê Kurd Erdal jî dê wek qerekterek mafyatîk di fîlmê de cih bigre.

Erdal Ayna herwiha got: “Baweriya kesî tuneye ku ez dê ji nav vî gundê ji nav van keviran derkevim û di projeyên navnetewî de cih bigrim.Lê ew kes jibîr dikin ku Yilmaz Guney jî ji nav van keviran,ji nav vê axê ji nav van heywanan derketîye ez jî wî ji xwe re mînak digrim.”

Malbata şanoger Erdal her çendî ji dahata giştî ya karên hunerê bêhêvîbin jî çeverê ne ku Erdal bi her awayî di karê xwe de biserkeve.

Jimama wî Muhbet Ayna jî dibêje: “Bila here Amerîka. Nanê mirov li kuderê be biîe wê derê normal e.Lê bila jiyana wî bi rêk û pêk be.”

Dayîka wî Eydê jî got: “Wî jina xwe daye ser hunerê. Vaye 16 sale vî karê dike. Dev ji zaningehê berda tu karek ji bavê xwe re nekir. Tenê bi şopa lîstikvaniyê ketiye. Ev ji xwe re kiriye pîşe. Xwedê keda kesî vala nexe û ya wî jî.”


Derhênere fîlmê Darryl D.Johnson jî bi hevnasîya lîstikvan Erdal Ayna gelek şanaz bûye ew bawer e ku di rojên pêş de lîstikvanê Kurd dê gelek serkeftina bidest bixe.

Derhêner Darryl D.Johnson jî wiha axivî: “Dema me cast çêdikir ew lîstikvan jî hatibû. Wî xwendina xwe dikir û wê demê bala min gelekî kişand. Dûre min jê xwest ku ew bixwe vîdeoyekê çêbike. Wî kir û ji min re şand. Dema gihîşt ber destê min ez ecêbmayî mam, pir li xweşa min çû. Ji bo Erdal dikarim bêjim ku di filîmekî de wî kesekî qop (seqet) lîstiye. Birastî aliyekî taybet divê ji bo mirov karibe kesekî qop bilîze. Dema min wî wisa dît min fam kir ku ew kesekî ji derveyî rêzê ye.”

Di fîlmê de ji xeynî Erdal Ayna lîstikvanên navdar ên Amrîkî Turth Hurts û Ezekiel Ajaigbe cih digirin. Piştî keşanê ev fîlma dê li seranserê dinyayê were pêşandan. RÛDAW

## Nûredîn Zaza yan ‘Çexovê Kurd’ ji bilî siyasetê ji bo wêjeya kurdî jî kedek mezin da

**Nûredîn Zaza siyasetvan û rewşenbîrê Kurd li tenişta xebata xwe ya siyasî, di warê wêjeya kurdî de jî mijûl dibû. Zaza çîroknivîsekî jîr bû. Zaza ku sala 1988an koça dawî kir, çîrokên xwe di govarên Bedirxaniyan de belav dikir û çîrokên wî bêtir derbarê rewşa gelê Kurd de ne û Zaza di wan govaran de behsa doza rizgariya Kurdistanê dikir.**



Nûredîn Zaza ne tenê têkoşer û siyasetmedarekî Kurd bû, lê di warê wêjeya kurdî de jî, di aliyê wergerandin, helbest û çîroknivîsiyê de xwedî ked û tilîmoreke berçav bû. Mîr Celadet Bedirxan ewqasî bi çîrokên Zaza sersam bû ku navê wî kiribû Çexovê Kurd.

Nûredîn Zaza çîroknivîsekî jîr bû. Piraniya kurteçîrokên xwe li jêr navê “Nûredîn Ûsif” di kovarên Hawar û Ronahiyê de li Şamê, di salên navbera 1930 û 1940an de belav kir. Bi taybetî çîrokên wî yên bi navê: Perîşanî, Hevîna Perîxanê, Şîretên Ehmedê Xanî, Ji Xortan Re, Keskesor, Gulê û Xurşîd.

Çîrokên Zaza pexşaneke wêjeyî ya bedew in, bi kurdiyeke şîrîn û zelal, li dor mijarên kurdî ne. Honaka Zaza ya çîrokê modern û nûjen bû. Mijarên çîrokên wî girêdayî serbestî, milet û welatperwerî û rizgariya Kurdistanê bû.

Zaza bi rêya çîrokên xwe zulm û zordariya ku li ser gelê Kurd tê kirin nîşan dide, qala dostanî, dildarî û evîna rasteqîn dike û behsa şoreş û serhildanên kurdan dike. Bi zimanê xwe yê kûr û herikbar û şîrîn dilê xwîneran bi xwe ve girê dide.

Di çîroka “Perîşanî” de, Zaza bi peyvên ku agir bi dilê mirov dixin, behsa jana xerîbî û dûrî welatiyê dike, bedewî û hêjatiya Kurdistanê diyar dike. Li Şamê, dilşikestî li hafa pencereyekê li derve dinihêre û wisa dibêje:

“Li taxa Mihaciran, ji oda xwe temaşa bexçeyên Şamê dikim. Ji nişkê ve zozanên Kurdistanê ên bilind, bi dar û avên cemidî tên bîra min. Ez xwe li wê derê, li ser kanîkê, li bin daran dibînim. Doraliyên min giş hêşînayî ne. Ji bihnên xweşik pozê min vedibe û sînga min hildibe. Çiqas bi kêf im, çiqas bextiyar im, bihuşt! bihuşteke rastîn.” RÛDAW

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Qedera Anîsa Ceiferîmêhr piştî 10 rojan nexuya ye

Qedera Anîsa Ceiferîmêhr, çalakvana ferhengî a bajarê Şabad ya ser bi parêzgeha Kirmaşanê, piştî 10 rojan nexuya ye.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, ew çalakvana ferhengî di heyama binçavkirinê de, tenê yek car pêwendiya telefonî digel malbata xwe girtiye û ji çavpêkevtina malbatê bêpar kirine.

Herwisa wê çavkaniyê ragihand: Parêzerê wê jina çalakvan a ferhengî lipeykevtina dosiyaya wê dike û di çend rojên bê de yê dosiya wê bo dadgehê bişîne.

Kerestеyên kesî yên wê çalakvana ferhengî yên wekî, leptap, telefon û hind ji kerestеyên din, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine zevtkirin.

Roja Duşemî 3ê Sermawezê, hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyekî yasayî êrîş kirine ser mala wê çalakvana ferhengî û dest bi vekolîna mala navbirî kiribûn.

“Anîsa Ceiferîmêhr”, xwendikara qonaxa karnasî ya beşa zimanasî a zanîngeha Kurdistanê ye.

Heya dema belavkirina vê nûçeyê, ji sedema binçavkirina wê çalakvana ferhengî, ti zanyariyek ji ber dest de nîne.

## Sê welatiyên Kurd li parêzgeha Urmiyê hatine binçavkirin

Pêwendiyên giştî yên “Biryargeha Seyd El-Şuheda” a hêzên bejayî yên ser bi Spaha Pasdaran, bas ji binçavkirina sê welatiyên ku bi tohmeta endambûn digel Partiyên kurdî yên dijberî hikûmeta Îranê li parêzgeha Urmiyê kiriye.

Pêwendiyên giştî yên “Biryargeha Seyd El-Şuheda” di peyamekê de, bi bê nîşandana ti belgeyekê, tenê bi belavkirina wêneyekê, bas ji binçavkirina sê kesan kiriye ku hewla karên xirab dane.

Navendên ewlehî, di wê daxuyaniyê de amaje bi nasnameya wan sê kesan nekiriye û tenê amaje bi binçavkirina wan sê kesan li ser sînorê “bakurê Rojhilatê Kurdistanê” kiriye.

Her di vê derheqê de, roja Çarşemî 21ê Xezelwerê, kanalên xwecihî yên bajarê Sunqur û Kulyayî, belav kirine sê welatî li wî bajarî ku endamên yek ji Partiyên Kurdî yên dijberê hikûmeta Îranê bûne di wî bajarî de binçav kirine.

## Du kolberên Kurd li ser sînorên Bane û Serdeştê hatine birîndarkirin

Roja Duşemî 10ê Sermawezê, kolberekê Kurd yê bi navê “Şîrwan Mûsapenahî” xelkê “Nelas” yê ser bi bajarê Serdeştê bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînorê wî bajarî hate birîndarkirin.

Ew kolberê Kurd li ser sînorê “Nokan” yê bajarê Serdeştê bi bê agehdarkirina berê rastî gullereşandinê hat û bo çareseriya pizîşkî bo navenda dermanî ya bajarê “Qeladizê” li Başûrê Kurdistanê hate veguhastin.

Di heman rojê de, kolberekê din yê bi navê “Xizir Resûlî” xelkê bajarê Baneyê bi sedema peyketin hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînorê “Nenor” yê ser bi wî bajarî ji bilndahiyê ketiye û birîndar bûye.

Ew kolber bo çareseriya pizîşkî bo navenda dermanî li bajarê Banê hate veguhastin.

## Kolberekî Kurd bi teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînorê Urmiyê hate birîndarkirin

Roja Yekşemî 9ê Sermawezê kolberekî Kurd yê bi navê “Ayhan Xudayî” yê 22 sal û kurê Cemal, xelkê gundê “Koran” yê ser bi devera soma û birdust a girêdayê bajarê Urmiyê bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînorê wî bajarî bi dijwarî hate birîndarkirin.

Pêka çavkaniyek agehdar, gulle li serê wî ketiye û rewşa wî ya tenduristiyê nebaş e.

Herwisa wê çavkaniyê di berdewamiyê de gotiye, ku ew kolber bi bê agehdarkirina berê rastî gullereşandina hêzên leşkerî hatiye.

Wê çavkaniyê daye zanîn: “Ew kolber bo çareseriya pizîşkî bo nexwşxaneya Azerbaycan ya bajarê Urmiyê hatiye veguhastin û niha li jêr çavedêriya pizîşkî de ye.

Ayhan Xudayî xêzandar e û bavê du zaroka ye.

# Agirî


- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (387)


## Çandina dindikên berûyan di çepera xebatê de







